## Di têkoşîna dijî Dijayetiya bi cihûyan ra divê çi bê kirin?

Navçeya Viersen'ê beşeke parêzgeha NRW'ê ye civaka herî mezin a cihûyan li Almanyayê tê da dijî. Ev parêzgeha têkoşîna li dijî Dijayetiya bi cihûyan ra wek bingeha pêkvejiyana aştiyane dizane.

Di serdema Reyşa sêyem (Dritten Reich) da navçeyên cihûnişîn li Viersen'ê hatin wêrankirin û cihû hatin kuştin.

Roja îro jiyana cihûyan li Almanyayê li kenîseyan (perestgehên cihûyan) derbas dibe ku divê ewlehiya wan were dabînkirin, hîn jî hin êrîş li ser cihûyan pêk tê.

Tevî ku êdî ti navçeyeke cihûnişîn tuneye, cihû beşeke tekûz a navçeya Viersen'ê ne.

Navçeya Viersen'ê ji bo têkoşîna li hemberî Dijayetiya bi cihûyan ra hewil dide û derbarê jiyana cihûyan û pêşdadweriyên derheqê cihûyan têbîniyan belav dike da ku pêkvejiyana pirrçandî cih were û gişt bikarin di vê pêkvejiyanê da xwedan pişk û rol bin.

## Têkilî


**Tristan Osterfeld**
Telefon: 02162 39-1719
Faks: 02162 39-1726
tristan.osterfeld@kreis-viersen.de

**Michael Sönnert**
Telefon: 02162 39-1776
Faksx: 02162 39-1726
michael.soennert@kreis-viersen.de



Piştgirîbûyî ji aliyê:

Ministerium für Kinder, Jugend, Familie, Gleichstellung, Flucht und Integration des Landes Nordrhein-Westfalen

Ministerium für Schule und Bildung des Landes Nordrhein-Westfalen



KREIS VIERSEN

**Sozialamt**
– Kommunales Integrationszentrum –
Rathausmarkt 3 | 41747 Viersen
www.kreis-viersen.de

Herausgeber: Kreis Viersen – Der Landrat
Stand: November 2022
Fotos: ©Krakenimages.com – stock.adobe.com


KREIS VIERSEN

Kommunales Integrationszentrum Kreis Viersen



# DIJAYETIYA BI CIHÛYAN

## Dijayetiya bi cihûyan ra di rastiyê da çi ye?

## Dijayetiya bi cihûyan ra çi ye

Hevpeymaniya Bîranîna Holokastê ya Navneteweyî (IHRA) ji bo tevgeriyana li dijî Dijayetiya bi cihûyan ra danasîneke navneteweyî ji Dijayetiya bi cihûyan ra raber kiriye. Ev danasîn hem li Komara Almanyayê ya Federal û hem jî li parêzgeha NRW'ê hatiye pesendkirin û divê wek amûrek ji bo ciyawazkirina raderbirrîn û Dijayetiya bi cihûyan ra were bikaranîn.

Ev danasîn bi vî awayî ye:

" Dijayetiya bi cihûyan ra sêwirandineke taybet ji cihûyan e ku dikare bi awayê nefreta ji cihûyan were diyarkirin. Dijayetiya bi cihûyan ra di gotin û kiryarê da li dijî kesên cihû an ne-cihû û heyîtiyên wan û her wiha li dijî saziyên navçeya cihûnişîn an navendên wan ên mezhebî ye."

Her wiha ev danasîn ji aliyê dewleta federal va hatiye kemilandin:

"Ji bilî vê yekê, dibe ku welatê Israîlê jî ku di vî warî da wek Giştiya Cihû tê zanîn, bikeve ber van êrîşan."

Bi mebesta misogerkirina kiryara yekane ji bo têkoşîna li hemberî Dijayetiya bi cihûyan ra, Navenda Hevahengiya Pêşîgirtin li Zêdegaviyê (KoEx) li navçeya Viersen'ê jî bi vê danasîna bifermînaskirî di asta navneteweyî da dixebite.

## Cûreyên dijayetiya bi cihûyan

### Dijayetiya bi cihûyan ra ya kevn

di Dijayetiya bi cihûyan ra da wisa tê sêwirandin ku kesên cihû ciyawaz digel civakê ne. Kesên cihû wer xuya dike xwedan desthilat û hêz in û wê neçê bi kar tînin. Loma ew ziyanê digihînin kesên din. Ji ber vê yekê Dijayetiya bi cihûyan ra wek berevanî û lihembersekinîn jî tê wesifandin. Ev yek dibe sebeba cihê sûcdar û gorî ku bi rêya wê yekê dijayetî, êrîş an jî meylên ji bo jinavbirinê tên pînekirin.

### Dijayetiya bi cihûyan ra ya têkildarî Israîlê

Di Dijayetiya bi cihûyan ra ya têkildarî Israîlê da, li gorî hin sêwirînan rûbirûbûneke dijminane digel Israîlê pêk tê ku di rastiyê da ne durist in. Hin taybetmendî dikarin bên têderxistin ku weke cûreyên kevn ên Dijayetiya bi cihûyan ra ne: Israîl ne ji ber tiştê ku Israîl e, belkî ji ber tiştê ku derbarê Israîlê tê sêwirandin, dikeve ber rexneyê – û tiştê ku tê sêwirandin bi nîqaşa li ser mafê hebûna Israîlê va girêdayî dibe ku nîşana meyla ji bo jinavbirinê ye.

Rexneya ji Israîlê xwezayî ye ku pêkan e, lê ev rexne divê bi rêya Ezmûna 3D'yê ji bo Dijayetiya bi cihûyan ra ku rexneyê ji hêla mînakên fikirî yên Dijayetiya bi cihûyan ra vedikolîne, serkeftî derkeve:

- Gelo Israîl weke Ehrîmen (dijminê xedar) tê naskirin, wek mînak gelo weke Naziyan tê zanîn?
- Gelo hebûna Israîlê nerewa tê zanîn?
- Gelo standardên ducûre tên sepandin, yanî hin pîvanên ciyawaz digel welatên din derbarê Israîlê tên berçavgirtin?

Eger bersiva bo her sê pirsan nerênî derkeve, ev rexne Dijayetiya bi cihûyan ra nîne.

### Dijayetiya bi cihûyan ra ya pêkhateyî

Dijayetiya bi cihûyan ra ji nav naçe, belkî bi awayekî nû dîsan xuya dibe. Di Dijayetiya bi cihûyan ra ya pêkhateyî da sêwirandinên klîşe yên Dijayetiya bi cihûyan ra ya kevn bo sêwirandinên din ên ji dijmin tên veguhestin: Wek mînak komeke kesên sereke yên şerxwaz ku dixwazin zirarê bigihînin kesan. Weke cûreyên din ên Dijayetiya bi cihûyan ra li vir jî meyla ji bo jinavbirinê têkildarî dîmena sêwirandî ji dijmin a jipêşva-resimandî heye: Eger ew nebûna, dê rewş baştir bibûya.

Ev babet di bîrdoziyên komplo û cûreyên rexnegirtina aborî da diqewime: Di rewşekê da ku ji bo pirsgirêkên pêkhateyî hin kes an kom wek berpirs bên naskirin, ev yek Dijayetiya bi cihûyan ra ya pêkhateyî ye. Mînak li wan cihan tên dîtin ku tunene.

Eger bersiva bo pirsên xwarê erênî be, ev yek Dijayetiya bi cihûyan ra ya pêkhateyî ye:

- Gelo di çîrokeke kes, kesên jîr û bijare an kompaniyên şerût û qirêj da mirov dikare peyva "Cihû"/"Cihûyan" li dewsa wan dayîne û di vê rewşê da sêwirandinên klîşe derbarê Dijayetiya bi cihûyan ra dikarin bên têderxistin?
- Gelo çîrok bi awayê teorîk li vir dixitime ku cîhan divê ji destê wan were rizgarkirin?

### Dijayetiya bi cihûyan ra ya Îslamî

Di Quranê da jî hin beş hem di warê piştevaniya ji cihûyan û hem jî li dijî cihûyan hene, beşa duyem a di warê Dijayetiya bi cihûyan ra wek hegera rewa tê bikaranîn. Di vê beşê da cihû wek nizimtir û kêmtir ji misilmanan tên zanîn. Her wiha Dijayetiya bi cihûyan ra ya Îslamî pêkhatî ji çîrokên komplo û Dijayetiya bi cihûyan ra ya têkildarî Israîlê ye. Ev cûre pirranî wek "Dijayetiya bi cihûyan ra ya jidervehatî" tê binavkirin. Helbet Dijayetiya bi cihûyan ra tam di civaka pirranî da heye û Dijayetiya bi cihûyan ra ya Îslamî tenê li cihekî dikare jiyana xwe bidomîne ku Dijayetiya bi cihûyan ra ji pêş va jî hebe.

Armanca vê gotinê bi rastî bêhitbarkirina kesên bi baweriyên îslamî an jî Îslamê nîne. Têkoşîan li hemberî Dijayetiya bi cihûyan ra her wiha nabe ku wek behaneyek ji bo qewirandina misilmanan were bikaranîn.